

ÇIROKÊN KEDKARÊ PIRTÛKÊN KURDÎ



Lukman Polat

Nivîskarê pirtûka "Bihuşta Lal" Selahattîn Bulut, kedkarê pirtûkên kurdî ye. Wî li taxa herî xweş ya Stenbolê pirtûkxaneyê vekiriye û hemû cure pirtûkên kurdî digehîne ber destê xwendevanên kurd. Kurdên ku ji welat û ji Ewropayê têne, miheqeq riya xwe li dikanê Kek Selah dixin û hem halî wî dipirsin û hem jî kovar û pirtûkên kurdî dikirin, dixwînin.

Hezkirê ziman û edebiyata kurdî û kedkarê pirtûkên kurdî Selahattîn Bulut bi navê "Bihuşta Lal" pirtûkeke xwerû bi kurdî ya kurteçîrokan weşand. Pirtûk li ser hev ji deh çîrokan pêk dihê. Naveroka kurteçîrokên wî, gelek balkêş in. Wî li ser derbeyê, guherîna navên gund, navçe û bajaran nivîsiye û bi şeweyê edebî mijarê xistiye rojevê. Kurteçîrokên wî, bi zimanekî sade hatiye nivîsîn û ji hêla xwendinê ve gelek herîkbar e, xwe bi xwendevan

dide xwendin.

Nivîskarê pirtûka "Bihuşta Lal" Selahattîn Bulut ji Dêrika Mêrdînê ye. Di sala 1981-ê de hatiye girtin û 8 sal di hepisxanê de girtî maye. Wî di sala 1997-an de Li Stenbolê "Kitêbxaneya Medya" damezrandiye. Wî li ser rojnamevan Hafîz Akdemîr û rojnamevan, nivîskar û siyasetmedarê kurd Edîp Karahan pirtûk amade kiriye. Di hin kovar û rojnameyan de nivîs û çîrokên wî hatine weşandin û weke pirtûk "Bihuşta Lal" pirtûka wî ya yekem ya bi kurdî ye.

Di çîroka bi sernavê "Lal" de nivîskar mijara qedexekirina kurdî axaftinê ya li girtîgehê dihîne zimên. Pîra yê girtîgehê bi tirkî nizane. Pîrê dixwaze biçê neviyê xwe yê girtîgehê bibîne. Pîrê diçe girtîgehê. Neviyê wî bi tirkî dipirse; "Tu çawa yî?" deng nîn e, "Xalanên min û ew çawa nin?" bêdengî didome, "Çavê te ronî neviyên te yên nû çêbûne..." hes û hawar nîn e, bavê wî dikeve navberê, "Kurê min tu dizanî pîra te ji zarokatî ve lal e..." Û pîrê her hefte bêyî ku peyvekê ji devê wê derkeve her diçe serdana neviyê xwe û her ku digihîje ber deriyê girtîgehê leşker dibêjin; "Pîrê lal e, berdîna bila here."

Weke dihê zanîn nivîskarê navdar yê îngilîz Harold Pînter ku îsal xelata Nobelê wergirt, li ser qedexekirina peyvandina bi kurdî ya li hepisxanê berhemeke şanoyî nivîsî. Ev berhema wî li gelek ziman hate wergerandin û bala raya cîhanê kişand ser qedexekirina kurdî.

Çîrok dîmeneke ji demên jiyana însan û bûyerên civakî radixin ber çavên mirov. Di hinek çîrokan de mirov xwendevan xwe dibîne yan jî bi saya wê çîrokê demên xwe yên bihurî, ango paşeroja xwe bi bîr dihîne. Dema min çîroka "Rê" xwend, biçûkatiya min, riya navça Licê û Diyarbekirê û her weha otobusa Licê ya mala Hecî Heyder hate bîra min.

Di çîroka "Gewrê" de, rewşeke du alî heye. Di aliyek de evîna bûka teze ya dewisandî û di alî din de adetên civatê yên serdest hene. Di gel van her du aliyên du hêlên wê yên din jî hene. Ji hêlek ve şer û pevçûna di nav bûk û xwesûyê de û ji alî din ve tenêbûna Gewrê, nehatina mêrê wê yê li leşkeriyê û problema wê ya cinsî, ango daxwaza wê ya seksê, bûka ciwan Gewrê dixwe haleke nebaş û rewşa wê ya psîkolojîk xirab dike, derûniya wê serûbin û tevlihev dike.

Di nav bûk û xwesûyan de her tim nakokî hene. Min hêj nedîtiye ku bûk ji xwesûyê û xwesû ji bûkê hez bike. Hinek xwesû zilimkar in, li bûka xwe neheqî dikin, pê eziyet, zahmetî didine kişandin. Xwesûya Gewrê ji hemûyan xirabtir dike û bûka xwe bi destên her du kurên xwe dide ber lêdanê.

Naveroka çîroka "Bayê Xurifî" hineke mîzahî ye, îronî ye. Apê Seydî bi naturê xwezayê re pev diçe û gule bera bayê dide. Di vê çîrokê de temaya feqîrî, serma û seqem xezeba naturê- hatiye ravekirin.

Di qalkirina guhertina navên kuçe, mahle û gundan de û bi fermana qaymeqam ji holê rakirina kevira ker de realîzmeke sosyal civakî û realîstiya konjoktura welatê me heye. Di vê çîrokê de bi şêweyeke hunerî û edebî hovîtiya dewleta Tirk ya guhartina navê gund, deşt, çiya, bajar, kevir û kuçên Kurdistanê hatiye nexşandin.

Li welatê me runîştvanên welêt yên tirk nîn in, yên ku hene ji derve hatine, leşker in, fermanîdar in, polîs in û karmendên dewleta dagirker in. Rewşa welatê me û dagirkeriya dewleta tirk di çîroka "Kevira Ker" ya Dêrikê de pir baş û zelal xuya dike. Ji xwe ev gotinên qaymeqam rastiya welatê me û karmendên dewleta dagirker baş dide diyarkirin. Qaymeqam dibêje: "ev çar meh e ku ez liv ê qezayê me, lê mixabin rojekê tenê hîsek ku ez li qezayeke welatê xwe me bi min re çênebû. Kesek bi zimanê me napeyive, navên kuçeyan, riyan, meheleyan û gundan bi zimanekî din e, navên zarokan bi zimanekî din e, dawetên xwe bi zimanekî din digerin, li tu derê ala dewletê û resmê Şefê Ebedî nabînim, ez ji vê rewşê gelekî aciz im û ez vê yekê nema qebûl dikim. Navên kuçeyan, mehele û gundan ên bi zimanê xelkê hûnê tev bigehurin, bikin zimanê dewletê û ji îro pê ve qeydkirina navên zarokan ên bi zimanê wan û di şîn û şahiyên de stranên wan qedexe ne, ez nebînim û nebihîzim!.."Ev gotinên qaymeqam dide xuyakirin ku ew wekî xerîbekî, karmendekî li welateke din e. Ev welat yê qaymeqam nîn e û insanên vî welatî ji nejada, netewa qaymeqam nîn in. Lê, qaymeqam karmendekî dewleta dagirkere û bi çova zorê, bi zilm û zordariyê navê kuçe, gund û mahaleyên kurdan digehurîne, dike tirkî.

Di çîroka bi navê "Derbe" de, tirsî gundiyeke Kurd Seydayê Biroyî-ya ji leşkerên Tirk dihê ravekirin. Hetanî ku welatê me di bin dagirkeriya dewleta tirk de be û di bin potînên askerên tirk de binale, dê tirsî polîs û askerên tirk li ser zarokên kurd, gundî û bajariyên kurd bidome. Kengê ku welatê me rizgar bû û gelê me

azad bû, wê demê dê ev tirs ji holê rabe.

Çîroka "Teyrika Bihuştê" çîrokeke sosyal civakî ye. Dilê mirov bi hal û rewşa Pîra Fatê dişewite û mirov gelek li ber dikeve ku çî eqûbet dihê serê keça ciwan ya ku navî Şûkran e. Trajediya Şûkranê dil û kezeba mirov dişewitîne.

Di çîroka bi navê "Şerbik" de serhatiya Apo Reşo hene. Ez hêvîdarim ku Kek Selah çîrokên Apê Reşo (çend heb di kovarên kurdî de derketibû) weke pirtûk amade bike û di demên pêş de biweşîne.

Ez bi xwe ne zimanzanîm, lê li gorê ku zimanzanên kurd yên ku vê pirtûkê xwendine- dibêjin : "Bi giştî zimanê pirtûka Bihuştal gelek xweş, petî û rewan e. Ji ber ku bûyer li herêma Dêrika Çiyayê Mazî derbas dibin, weha xuyaye ku nivîskar Selahattîn Bulut bi zanebûn giraniyê daye ser devoka herêma xwe angoya Dêrikê. Ev jî çêjê (tahmeke) xweş daye pirtûkê, bûyeran xemilandiye, xweş û geş kiriye."

Kurteçîrokên di pirtûka "Bihuştal" de ne, ji aliyên estetîk, wêjeyî û taybetiyên çîrokî ve nûjen in. Yanî bi gotineka kurt û kurmancî kurteçîrokên Selahattîn Bulut bi şêweyê nûjen li gor metoda çîrokên hevdem hatiye nivîsîn.

Wî bi nivîsîna vê berhema xwe ya edebî li refên pirtûkxaneya kurdî pirtûkeke din zêde kir û baxçeyê edebiyata kurdî bi rengeke din xemiland.

Min ne bi teferuat, lê belê bi kurtahî behsa naveroka hinek kurteçîrokên ku di pirtûka "Bihuştal" de ne kir. Min bi teferuat, bi şêweyê berfirehî behsa naveroka çîrokan bikiriba û bi metoda analîzê tevî, teknîk, stîl û her weha her tiştên çîrokan analîz bikira, binîrxandibana dê nivîsa min gelek dirêj bibana. Herî baş ev e ku; xwendevanên kurd berhema kedkarê pirtûkên kurdî (û niha jî waye bûye xebatkarekî edebiyata kurdî) Selahattîn Bulut ya bi navê "Bihuştal" bikin û bixwînin.

Ez hêvîdarim ku xwendevanên kurd dê bi balkêşî pirtûkê bixwînin û jê gelek tişt fêr bibin.

* Bihuştal / Selahattin Bulut / Weşanên Avesta / 70 rûpel